

Li Kurdistana Sûriyê siyaseta tinekirina azadiya rojnamevaniyê berdewam e

Kurdistan Cemal Yûsif



Di vê dema dawî de grûpên çekdarên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve, hejmareke rojnamevan revandin, û her sê peyamnêrên ARKê

Ehmed Sofî û Dara Ebdo û Sebrî Fexrî jî revandin, û çarenivîsa wan nediya e. Encûmena Niştîmaniya Kurdî ENKSê di daxuyaniyekê de revandina peyamnêrên

ARKê û siyaseta tinekirina azadiya rojnamevaniyê şermezar kir, û daxwaz ji Emerîka kir sînorekî ji van kiryanan re deyne ji ber ku dibin sedema nearamî li deverê. Di vê derbarê

de, Komîteya parastina rojnamevanan ku navenda wê Newyorkê ye daxwaz ji desthiltdarên bakurê rojhilatdarên Sûriyê kir di zûtirîn dem de hersê peyamnêrên ARKê û

tevahiya rojnamevanan serbest berde. Wê komîteyê ragehand, ew desthilat dixwaze hemû dengêkî cuda rawestîne, û rojnamevanên li ser erdê tenê rastîyan vedughêzin.

Şehîd Nesredîn Birhik hat bibîr anîn

Kurdistan-
Dilovan Mihemed

Li gundê Kevrê Dena yê ser bi Çilaxa ve, Serkirdeyê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Şehîd Nesredîn Birhik hate bibîranîn, û di merasîma bîranînê de hejmareke nûnerên partiyên siyasî û cemawerên Partiya Demokrata Kurdistanê amade bûn. Endamê Desteya Serokatîya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê Silêman Oso di gotarekê de ragehand, kesên wek Şehîd Nesredîn Birhik dê dilê miletê xwe de bimîne û dijmin ji kesayetiya Nesredîn Birhik ditirsiya lewma pîlana terorkirina wî da, û dazanîn heger duijminan Nesredîn Birhik şehîd kir, dê heval û hogir û malbata wî li şopa wî bimeşin. Di vê derbarê de Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Dr.Ehmed Melek ji ARKê regehand, Şehîd Nesredîn Birhik hertim zindî ye û nayê jibîrkirin, û ew zindî ye bi raman û fikir û kar û xebata xwe. Herwiha soza da ku ewê li ser rêbaza Şehîd Nesredîn Birhik



berdewam bin û ti carî ji vê rêyê venagerin heta ku armanc û xewnên wî bicih bînin. Herwiha di merasîma bîranîna Şehîd Nesredîn Birhik li Duhokê, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Hacî Kalo di gotarekê de ragehand, roja şehîdbûna Nesredîn Birhik rojeke reş bû di dîroka Kurdistanê de, Bavê Elaa kar û

xizmeteke zêde ji bo doza Kurd li Kurdsitana Sûriyê kiriye, û hemû jiyana xwe ji bo mafên gelê Kurd terxan kiribû, lê destikên dujminên Kurdan qebûl nedikir kesek xizmeta gelê xwe bike, lewma ew şehîd kirin. Kurê Şehîd Nesredîn Birhik di bîranîna salvegera şehîdbûna bavê xwe de wiha got, Şehîd Nesredîn Birhik hertim di riwê stemê de

radwestiye û giringî dida al û welat û axa xwe, wî hertim dixwest mafên Kurdên Kurdistanê Sûriyê misoger bike û got ji bandoreke wî ya mezin di avakirina Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê hebû, û dazanîn ew dest ji Rêbaza Barzaniyê nemir bernadin.

Şehîd Nesredîn Birhik: 22ê Sibata 2021ê şehîd bibû, 10 sal li ser şehîdîdbûna Nesredîn Birhik, Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S derbas dibin, ku li navçeyeke navbera Girkê legê û Dêrika Rojavayê Kurdistanê, ji aliyê kesin nenas ve hatibû gulebarankirin. Di roja Duşemê 132012-02-an de, şehîd Nesredîn Birhik ji aliyê grûpekî çekdar hate gulebarankirin, ji bo nexweşxaneyê Nûr ya Qamişlo hate veguhestin. Lê ji ber giranbûna birînen wî ji bo nexweşxaneyê Martînî ya Helebê hate veguhestin, tevî ku jê re çend neştergerî hatin kirin, lê ji ber birînen wî yê giran di 222012-2-an jiyana xwe ji dest da û şehîd bû. Şehîd Nesredîn Birhik

li gundê Kevrê Dena yê ser bi Çilaxa ve. Sala 1960î de ji dayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî û navendî li Çil Axa xwend, û ya amedayî li bajarê Hesekê berdewam kir, û li Dêrezorê bawernameya peymangeha Pêşesazî beşê Elektirîkê bi dest xwe ve xist.

Di despêka ciwaniya xwe de, tevlî Partiya Demokrata Kurdî li Sûriyê El Partî bû ku niha Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya ye, di gelek rêxistinên de beşdar kirin, û di Komîtên Partî de kar kiribû, ta ku 1998an de, bû Endamê Polîtîbroya Partî. Bi dilpakî û dilsozî li ser rêbaza Barzaniyê nemir xizmeta doz û gelê xwe dikir, lewma rastî gelek astengî û rêgriyan dihat, di raperîna 2004an de hate binçavkirin. Herweha sala 2009an ji aliyê rêjîma Esed ve hate girtin, lê ew yek bandor li ser vîn û xebat wî nekir. Di 13ê Sibata 2012an de, ji aliyê grûpekî çekdar ve hate gulebarankirin, û di 22 heman heyvê û salê de, Nesredîn Birhik bavê Ela şehîd bû, bi beşdariyeke mezin ji rûniştvanên Kurdistanê Sûriyê li gundê xwe li Kevrê Dena bi xak hate spartin.



Ciwanên Şoreşger zarokeke Efrînê ji Kobanê revandine

Kurdistan- Eyûb Xalid

Zarokeke 13 salî ku xelkê bajarê Efrînê ye ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger ya ser bi PiKK ve hatiye revandin û çarenivîsa wê jî nediyar e.

Mamê wê zarokê Mihemed Hesên ji Rojnameya Kurdistan re ragihand, keça birayê wî Meryem Ferîd Mihemed ya 13 salî (sala 2009an ji dayik bûye), ji roja 31ê Cotmeha 2021ê ve li gundê Şêranê yê Kobanê ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger ve hatiye revandin.

Mihemed Hesên diyar kir, biryarê wî Ferîd û keça wî Meryem piştî dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar ve, ji gundê xwe "Dêwa" yê li navçeya Cindirêsê koçber bûbû û demê li gundê Şêranê yê Kobanê bi cih bûye. Birayê min Ferîd ji dema revandina keça wî ve, li hemû gelek navend û bargehên Hêzên Sûriya Demokrat HiSD, YPIJ û saziyên din ên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PiYDê ve pirsra keça xwe dike û wî karî berî demê jî keça xwe li baregeheke Hêzên

Sûriya Demokrat HiSD li bajarê Heskê bibîne, lê fermanarên wê baregehê keça wî venegerandin, herwiha gef lê xwarin heger nûçeya revandina keça xwe bidin dezgehên ragihandinê û birayê min ji ber vê yekê agahî nedabûn ti kesekî, lê piştî sozên xwe bicih neanîn û keça wî venegerandin, me dest bi wê yekê kiriye ku nûçeya revandina keça xwe li ser ragihandinê belav bikin heta ku dengê me bighê tevahiya aliyan. Mihemed Hesên dibêje, birayê wî xwe gihandine nivîsîngeha Fermanarê Hêzên Sûriya Demokrat Mezlûm Ebdê, û gef lê xwarin heger careke din werie vê nivîsîngehê, û jêre gotin Meryem çû, û careke din lê nepirse wê baştir be.

Mamê keçê Mihemed Hesên bal kişandê ser wê yekê, birayê wî Ferîd ji derdê keça xwe nexweş e û temenê 65 sal e û biraziya wî Meryem ji aliyê dayikê ve keçeke bi tenê ye û diya wê jî ji berî çend salan ve wefat kiriye. Mihemed Hesên bang li hemû sazî û rêxistinên yasayî, mafên mirovan û aliyên pêwendîdar ên

navixwe û navdewletî dike ku destêwerdanê bikin, ta ku biraziya wî Meryema 13 salî vegeerînin male ji ber ku bavê xwe nexweş ketiye û di rewşeke gelekî zehmet de dijî.

Di vê derbarê de Rojnameya Kurdistan nerîna parêzerekî wergirt, wî parêzerî wiha got, revandina zarokan ji aliyê girpûpên ser bi PiKKê ve li Kurdistana Sûriyê berdewam e, û tevî ku navendek heye ji bo vegeerandina zarokan, lê ev yek ti karî nake û nikare ti zarokê vegeerî ji ber desthilat di destê wê de nîne, û hemû desthilat di destê PiKK de, Mezlûm Ebdê rêkeftin ligel Neteweyên Yekgirtî îmze kiriye, lê rêz li vê rêkeftinê nayê girtin, û revandina zarokan hêj berdewam e. Zarokên tene revandin piraniya wan jî ji dibistan û navendên ser bi ciwanên şoreşger tene revandin, û ev yek jî hemû bi pîlan tê kirin û karekî zêde jêre tê kirin, PiKK bi revandina zarokan hejmarê çekdarên xwe zêde dike û van zarokan bi xwe ve girê dide û mejiyê wan dişo.



Mela Mistefa Barzanî, serkirde û rêberekî bêhempa

Kurdistan

Mela Mistefa Barzanî rêberê mezintirîn şoreş di dîroka rizgarxwaziya gelê Kurdistanê de ye, di dirêjahiya temenê xwe de wî dest ji daxwazkirina mafên xelkê bernedaye, hewl ji bo bidestana daxwazên wî yên neteweyî daye û rêbazeke tijî daxwaziyên neteweyî û niştîmanî li pey xwe hiştiye û bûye serkirde û nimûneyeke bilind a rastgoyî û daxwaz û mafên neteweyî

Mela Mistefa Barzanî, di 14ê Adara 1903an de ji malbateke olî û netewperwer li Barzan jidayik bû. Ji diyartirîn çalakî û bîranînên tîrêxistin, serdana mezargeha Mela Mustefa Barzanî, tekezî li berdehamiya sozê bo rêbaza netewî û niştîmanî ya Mela Mistefa Barzanî, çandina daran û keskirina xaka Kurdistanê ye.

Jêderên dîrokî amaje bi wê dikin, tevgera rizgarîxwaz a Kurd û Kurdistanê bi navê Mela Mistefa Barzanî û şoreşên wî tê naskirin. Li gor dîroknivîsên Kurd û biyanî, Mela Mustefa Barzanî yekem serkirdeyê Kurd bû ku xebata Kurdî ji bazna navçeyîbûnê xiste xebata niştîmanî û her dem daxwaza mafê seretayê, mafê mirovî û kulturî bû. Daxwazên Kurd tevgera rizgarîxwaza Kurd bilind kir bo asta siyasî, tevgera rizgarîxwaza Kurd jî ji nebûna bernameyêke siyasî veguhast bernameyêke siyasî ya ron û diyar. Bi damezarandina Partiya Demokrat a Kurdistanê di 16ê Tebaxa 1946an de daxwazên netew ên Kurdî di çarçova bernameyêke partiyeke siyasî ya rêxistinkirî rêxist û xebata gelê xwe û proseya siyasî li Kurdistanê veguhast qunaxêke pêşketî.

Beşek ji westgehên jiyana Mela Mustefa Barzanî: *Mela Mustefa Barzanî kurê Şêx Mihemed Barzanî ye û li gundê Barzan di

14ê Adara sala 1903an jidayik bû.

*Di temenê 3 saliyê de ji aliyê Osmanîyan ve ji piştî şikestina Şoreşa Barzanî Şêx Ebdulsalam birayê mezin ê Mela Mustefa Barzanî hat girtin û Mustefa Barzanî û diya xwe ve li Mûslê hatin zindanîkirin.

*Heyama 6 salan ji aliyê çend mamosteyan ve li gundê Barzan mijûlî xwendinê bû û piştî Fiqhê Îslamê xwend û çar salan zanistên olî xwend û piştî jî li Silêmaniyê hewla temamkirina xwendinê da.

* Mela Mustefa Barzanî di sala 1919an de beşdarî di tevgera Şêx Mehmûd Hefîd li Silêmaniyê ku û serperîştîya tîmeke çekdarî ya 300 çekdaran kir.

*Di sala 1920an de biryarê wî yê mezin Şêx Ehmed Barzanî wî Mela Mustefa Barzanî wek nûnerê di Şêx Bakurê Kurdistanê ji bo serdana Şêx Seîdê Pîran bike û hevahengiyê bi şoreşê re dirust bike.

*Di navbera salên 1931 - 1932an serperîştîya hêzeke Barzaniyan dike ji bo berevanîkirina li mihwerê Mêrgesor - Şêwan li hember hêzên Îngilîzî û di wî şerî de ji ber jîrekî û karzaniya xwe bi navûdeng dibe û dikare wî mihwerî biparêze.

* Di sala 1934an de bi Şêx Ehmed Barzanî û hin ji piyayên wî diçin Tirkîyê ji bo daxwaza mafê penabertiyê bikin û piştî vedigerin Iraqê û ji aliyê Îngilîziyan û desthilata Iraqê ya wê demê bo başûrê Iraqê tîrêxistin û piştî 10 salan vedigere Silêmaniyê.

* Di 12ê Tîrmeha 1943an de bi hevkarîya rêxistina Hîwa li Silêmaniyê karî derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibe.

* Di heman salê de ji Îranê vedigere navçeya Barzan û hejmarek xort li dor xwe kom dike û du mehan 2 hezar çekdarên xwebexş amade dike û dikarin dest danin binkeyeke polîs li

navçê.

* Di Payîza 1943an de hikûmeta Bexdayê şandekê dişîne Barzan ji bo şer bê rawestandî û Mustefa Barzanî mercê vegera tevahiya kesên sirgûnkirî û Şêx Ehmed dike û hikûmeta Nûrî Seîd hemû mercên Mustefa Barzanî bicih tîne.

* Di sala 1943 - 1945an de Şoreşa Barzan li dijî hikûmeta Iraqê ku hikûmeta Brîtaniya piştewaniyê lê dike serî hildide careke din şoreş li navçeyê fereh a Kurdistanê belav dibe.

* Di 22ê Çileyê 1946an de beşdarî di merasîma ragihandina Komara Kurdistan li Mehabadê de kir û ji aliyê Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed ve Barzanî dibe Fermandarê Artêşa Komara Kurdistan û pileya General pê tê bexşandin.

* 16ê Tebaxa 1946an Barzanî Partiya Demokrat a Kurdistanê damezrand û wek serokê partiye hat hilbijartin û li tevahiya kongreyên partiye de tevî di hinan de amade nebû jî wek serokê partî hat hilbijartin.

* Piştî şikestina Komara Kurdistanê, di sala 1947an de rêwîtiya dîrokî ber bi Sovyetê ve encam da û Barzanî amade nebû xwe radestî desthilatên Şahînsahê Îranê bike û ew ligel 500 çekdar ber bi Sovyet çûn û rûbirûyî artêşên Iraq, Îran û Tirkîyê bû.

* Roja 17ê Hezîrana 1947an Barzanî û hevalên xwe çemê Aras derbas kirin û gihîştin Sovyetê.

* Li Yekîtiya Sovyet ku Stalîn serokê wê bû, serederiya tund bi Barzanî û hevalên wî re hate kirin û piştî mirina Stalîn di sala 1953an de rewşa jiyana wan hinekî baş bû.

* Li Rûsya tevî derbaskirina temenê 45 saliyê, li Akademiya Zimanan li Moskojê destpê kir û aborî, goeografa, zanist û zimanê Rûsî xwend.

* Piştî şoreşa 14ê Tîrmeha



1958an, Barzanî û hevalên xwe vedigerin Iraqê û ji Besra û ta Hewlêrê camewer pêşwaziyê lê dikin.

* Serokomarê Iraqê Ebdilkerîm Qasim di 7ê Cotmeha 1958an pêşwazî li Barzanî û hevalên wî dike.

* Ji 11ê Îlona 1961 û ta 1975an Barzanî rêbertiya mezintirîn şoreşa çekdarî li dijî desthilatên Bexdayê kir û şoreşê 15 salan berdeham kir û tê de çendîn destkeftên netewî û niştîmanî ji gelê Kurdistanê re bidest hat.

* Di 11ê Adara 1970î Barzanî û hikûmeta Iraqê li ser porjeya atonomî ji Kurdistanê re lihev dikin û bo cara yekem di dîroka Kurdistanê de şoreşeke Kurdî bi 9 salên xebatê dikare wê destkeftê ji Kurd re bidest bixe.

* Di 6ê Adara 1975an bi sedema rêkeftina Sedam Husên û Şahê Îranê Mihemed Reza li Cezaîrê, şoreşa Îlonê rastî şikandinê tê û ji ber wê Barzanî û bi hezaran Pêşmergeyên şoreşê rîya koçberiyê hilbijart.

* Piştî şikestina 1975an careke din Barzanî çavdêrî

û serperîştîya danîna kevîrê bingehê yê şoreşê kir.

* Di 1ê Adara 1979an Mela Mustefa Barzanî li Amerîka ji ber nexweşiyê koça dawiyê kir û di 5ê Gulana 1979an li ser wesiyeta wî li bajarê Şîno yê Rojhilatê Kurdistanê li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê bi xaka pîroz a Kurdistanê hat spartin.

* Piştî Raperîna Adara 1991an, termê Mela Mustefa Barzanî û Îdrîs Barzanî li aramiya xwe ji Rojhilatê Kurdistanê bo Herêma Kurdistanê cihê jidayikbûna xwe hat veguhastin û li navçeya Barzanî bi xakê hatin spartin.

* Di heyama jiyana xwe de du caran Mela Mustefa Barzanî rastî hewlên terorkirinê hat û mocîze hat rizgarkirin, yek di 29ê Îlona 1971an û ya duyem jî di 16ê Tîrmeha 1972an de bû, lê her du caran ji bo berjewendiya gelê Kurdistanê, parastina aştî û aramiyê Kurdistanê dirustnebûna şer, rêkeftina Adara 1970î ya bi Bexdayê re hilneweşand.